

Dumahîk : Rêwresma....

3-Gotina Encûmena Giştî ya Hevbendiyê Demokrat a Kurd li Sûriyê ji bal birêz **Mihemed Ceza**,a ve hate xwendin.

4-Gotina Pilatforma Danezana Şamê ya parêzgeha Hesekê ji bal birêz **Beşîr Al-Se,dî** ve hate xwendin.

5-Gotina dostên mamoste ji bal birêz **Zuhêr Al-Boş** ve hate xwendin.

6-Gotinek ji bal avokat **Mumtaz Al-Hesen** ve hate xwendin.

7-Gotina rêxistina jinê li Cezîrê, ji bal birêz **Diya Kawa** ve hate xwendin.

8-Gotina partiya me bi zimanê dê û bi zimanê Erebi ji bal Sekreterê Partiyê birêz **Mihyedîn Şêx Alî** ve hate xwendin.

9-Gotina malbatê ji bal **Bengîn Ismaîl Umer** ve hate xwendin .

Bi vî awayî, ahenga çilrojîya mamosteyê nemir Ismaîl Umer bi dawî hat.

Li jêr, deqê gotina Komîta rêvebir ya bi zimanê Kurdî ye:

Xwişk û birayên hêja...**Dostino, hevalino...****Beşdarên birêz...**

Hûn tev bi xêr hatin û ti te,iliyan nebînin.

Ev e bîranîna çilrojîya serokê parta me heval Ismaîl Umer e, yê ku piraniya we ew nas kiribûn, ne ku serokê partiyekê bû û hew, lê belê, mirovhezekî bihinferêh, nefisbiçûk, cefakêş û hişmend bû, xwedî nîrxên dostaniyê û rastgo bû. Lewre jî, berketiyên rehmetî gelek bûn û em karin bêjin bi deh hezaran bûn.

Ji bilî heval û hogirên rêxistinên parta wî li Sûriyê û li gelek welatên Awropî jî, bi hezaran ji biraderên Erebi, Siryan-kildo Aşûr, Çerkez, Ermen û Turkmen jî berketiyên mamoste Ismaîl bûn.

Birêketina bi hezaran xelk ji bajarê Qamişlo ta gundê Qereqoyê li pey cenaza

rehmetî, name û birûskên sersaxiyê yên ku ji derve û hundir bi ser me de herikî bûn, serdan û beşdarbûna ewqas ciwanik û camêr li bin konên sersaxiyê û li encûmen

û civatên sersaxiyê yên ku li gelek welatên derve hatibûn lidarxistin, bêguman nîşana gelek tiştên buha û bi wate bûn.



Di vê bîranînê de, hêjaye bête zanîn ku xebat û siyaseta Parta Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê, weke çawa hatibû naskirin, herweha jî, dê berdewam û li saz be.

Ew nîrxên mirovane, nîrxên xebata bona Aştî, Azadî û Wekhevîyê, yên ku heval Ismaîl û gelek nemirên mîna wî pê dihatine nasîn, her dê berçav û li ber me bin û bi vî hawî emê jê re wefadar bin.

Bi navê Komîta rêvebir ya Parta Yekîti ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê, em sipasiya we hemiyarê dikin, rêz û hurmet ji beşdarbûna we re, ji nûnerên Encûmena Siyasî ya Kurd re, ji Rêxistina Asûr a Demokrat û Danezana Şamê re, ji Parta hevpişk(Parta Pêşverû), Encûmena Giştî ya Hevbendiyê û kesayetiyên serbixwe re, ji nûnerên hemî rêxistin û partiyên Kurd, Erebi û yên Komonist re, ji rewşenbîr, zimanhez û komîteyên mafên mirovan re, hûn bimînin di xweşiyê de û sipas ji guhdariya we re.

Komîta rêvebir ya Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê

Qereqoyê : 26.11.2010Z

Hêjayî gotinê ye ku gelek name, nivîs, helbest û birûsk ji hundir û derveyî welêt gihane destê komîta amadekar, ji wan:

-Partiya Yekîti ya Kurd Li Sûriyê

-Mele Ehmedê Namî di helbista xwe de dibêje
Sotaye dilê me dûriya te

D.R (11)